

nemaye ji ber ziwabûna wan av û çema ji ber kêmbûna barîna baranê li çiyê .

- Lawir : Ji ber peyda bûna xakek têr gir û Kendal û newal û gelekê fireh û bê pariya wê xakê ji cot û hilkirinê , û zengîniya wê bi hemî corên geya di çiyê de , ew xake bûbû cihek hêja ji peydabûna hejmarek lawirên bejî re û ji xwedîkirina Lawirên hûger re , û Lawirên hûger yê li wir dihatin xwedîkirin û heya neha jî tên xwedîkirin li wir ji aliyê xelkên herêmê ve Mih , Bizin , Çêlek û Gamêş . Ji aliyê Lawirên bejî ve . Hejmarek Lawirên bejî li wir peydadibûn di berê de wek , Keftar , Gur , Torî , Beraz , Rûvî , Xezal , Kîvroşk , Sîxur û Jîjo û neha ji xeynî Xezalan , ev Lawire hemî li wir peydadibin lê bi hejmarek gelekê kêmbûn li gor berê . Ji aliyê balinde ve : gelek balinde li wir peydadibûn wek Sisyard , Alçîn , Kevokên bejî , Lekleg , Mirîşkên avî , Kundo û Beytik û dîsa neha piraniya van balindan li wir peyda dibin , ew jî bi hejmarek gelekê kêmbûn li gor berê . Tevlî van hemyan gelek corên Maran , Dûvpiştkan , Marmarokan , Nehengên piçûk , Gimgimokan û Mehîcekan li wir peyda dibin .

- Petrol di çiyayê Qereçoxde : Di 31 / 3 / 1956 kompaniya Necîb Menhel destpêkirina karê lêgeryana petrolê û kolana bîrên petrolê di çiyê de kir , û karê vê kompaniyê berdewam kir heya 5 / 10 / 1958 an , û bi karê vê kompaniyê bi cara yekem petrol hate dîtin di çiyayê Qereçox de û di Sûryê de û dûv re mafê lêgeryana petrolê di çiyê de , hukumetê da kompaniya Konkordiya Elmanî û vê kompaniyê karê lêgeryanê û kolanê di çiyê de berdewam kir heya sala 1962 an , û ji vê dîrokê ve û heya neha kompaniya Sûrî ya petrolê karê lêgeryanê û kolanê di çiyayê Qereçox de berdewam dike .

Di gel van hemî gotinan , çiyayê Qereçox buhar û havînan dibe seyrangehek xweş û delal û gelek xelkên herêmê rojên xwe lê derbas dikin û bihna xwe lê fireh dikin , û nemaze piştî çandina aliyê başûrê çiyê bi darên Sero û Sinoberan Bi dawîya vê gotarê , hêvîdarin em di riya vê gotarê re gihibin armanca xwe , ew armanca naskirina xwendevanan û gelê Kurd bi çiyayê.

Qereçox û hêvîdarin kêmasiyên me cihê lêborîna xwendevanên mebin .

**Jêderên gotarê :**

- Ronîkirin li ser tevgera Kurdî di Sûryê de , Mamoste Ebdul Hemîd Dirwêş .
- Kovara taqa , ya wîzaretê petrolê li Sûryê .
- Helbest û stiranên Kurdî yê kevnare .
- Ji devên kala û xelkên herêmê , bi taybetî Muhemed Reşîd ji gundê Sêgira .
- Tilvizyona Kurdistan .Tv .

25 / 12 / 2007

**Ev gotar ji malpera NEWROZê hatiye wergirtin**

**Dhmahîk : Nameya...**

, hûn dê bibine Mandêlayê Turkiyê û xwedî cîgehekê rêzdar di dîrokê de, weke çawa Nêlson Mandêla li Başûrê Efrîka bi riyên aştiyane çareserî peydakiribû , cî girtibû , û dîrok jî her dê wî bi bîr bîne û sipasiya wî bike , vêca, hûn jî dikarin xwediyê rol û cîgehekê weha bin ).

Hêjayî gotinê ye ku balyozxana Turkiyê li Londonê erê nekiribû ku nameya Toto werbigire , lewre jî, şandeka li ser navê birêz Toto biryar dabû ku wê di riya balyozxana dewleta Başûrê Efrîka re , dê wê nameya dîrokê bighîne destê Erdogan .

Dêzmon Toto li sala 1931 an li Başûrê Efrîka ji dayîk bûye , têkoşerekî navnetewî , bêhempa li dij nijadperestiyê li seranserî cîhanê hatiye nasîn . Li sala 1984 an xelata Nobêl bona aştiyê wergirtiye , ji bilî gelek xelatên dî , û hê serokatiya komîta aqilmendan dike . Ev komîteya he, ya ku kesayetiyên xwedî rol , pir navdar û naskirî , mîna pêşewayê başûr Efrîkayî Nêlson Mandêla , serokê Emrîkî yê berê Jîmî Kartir û sekreterê giştî yê Netwayê Yekbûyî yê berê Kofi Enan di çerçewa endametiya xwe de hembêz dike .

**Sînorê Yekta**